# Newroz



*Dr Nûredîn Zaza*
*1919- 1988*



*Osman Sebrî*
*1905 - 1993*

*Xebat ji bo* : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê* - YEKÎTÎ

*Hejmar ( 96 ) sal 16 Sibat 2011 z - 2622 k Buha ( 15 )ps P.S*

## Guhartinên mezin

Li vê dawiyê , piştî têkçûna rejîma serok Zeyn-elabidîn bin Elî li Tûnisê û ya serok Hisnî Mobarek li Misirê , xwepêşandanên berfireh li Lîbiya , Behrên û Yemenê dest pê bûn û hê berdewam û li darin . Ji bilî xwepêşandanên li hin deverên Urdon û Îraqê , herêma Kurdistanê jî di nav de , nemaze herdu bajarên navdar Silêmanî û Kerkokê . Û li hêla dî , nûbûna xwepêşandan û çalakiyên nerazîbûnê li Tehran , Ehwaz û bajarên herêma Kurdistana Îranê .

Karbedest serûber xemgîn û mijûl in , nikarin têr razin , çavsor û sergerim dibin , û ji ber ku ew malxur , setemkar û dizin , lewre jî xwe sopermirov dibînin , xwe di ser milet , welat û dewletên xwe re digrin û dixuye ew nikarin, nejî dixwazin rastiyên heyî bibînin , berjewendiyên gelên xwe , rûmet , azadî , jiyana rojane û mafên mirov û hemwelatiyên xwe binpê dikin , û loma jî ew hertim bi darê zorê , bi tevdîr û kiryarên hovane , bi dek û dolab û pîlanên nediyar û nehênî dixwazin bersivan bidin . Kul û derdê wan karbedestan , armanca wan ya herî sereke , domkirin û berdewamiya kursî û quretiya karbedestiyê ye û hew , vêca çi dibe bila bibe ! . **D. R. ( 11 )**

Email : Newroz 95 @ hotmail . com

Nama Gabrêl Garsya Markîz — Awazê Kalo — 4
Bi serbilindî. . . — Bavê Helebçe — 6
TRT6 Kûve di çe!? — Enehîte Murad — 9
15ê Gulanê Cejna zimanê kurdî — 10

www.arsivakurdi.org

 **Nûçe û Çalakî**

## Stêrkek geş
## ji nav refên xebatkarên Kurd vemirî

Li 26.1.2622k – 2011z xebatkarê Kurd ê bi nav û deng **Ibrahîm Zîbar ( Bavê Siyamend )** jiyana xwe ji dest dide û diçe ser dilovaniya Xwedê .



**Kurtejiyana**

**B.Siyamend :** Ibrahîm Zîbar di 8-2-1961 an de , li gundê Memila – herêma Efrînê ,ji dayik dibe. Ew di çarsaliyê de bi bav û diya xwe re barî bajarê Lazqiyê dike , xwendina seretayiyê li wir derbas dike , ya navînê jî li Tertûsê dixwîne ,li sala 1980 ê fêrnama bekelorya ya pêşesaziyê bi pileya yekê di ser Parêzgeha Lazqiyê tev de re distîne û paşê jî enîstîtûya pêşesaziyê werdigre û dibe endezyarê alîgir. Ew li sala 1986 an , li nexwaşxana Tişrînê semama dilê xwe diguhêre , û li 1995 an kiryara dilvekirinê ji xwe re çêdike .Di sala 1991an de ,ew bi riya apê xwe "EbdilHemîd Zîbar" derbasî nav refên Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd ( Yekîtî ) li Sûriyê dibe , ta dawiya temenê xwe di ber pirsa gelê xwe ya dadmend û rewa de, bê westan dixebite û mala xwe ji her Kurdekî re û bi taybetî ji xwendekarên Kurd re vedike û wek bavekî wan hembêz dike . Hêjaye em xuya bikin ,ku ew di 1986an de bi jin bû û çar zarok ( Rojîn, Siyamend , şêrîn û şiyar ) jêre çêbûn , lê mixabin Rojîn di şazdesaliyê de diçe ser dilovaniya Xwedê.

**Mirina hevalê nemir Ibrahîm Zîbar:** Li bajarê Lazqiyê dilê B.Siyamend radiweste, ji wir de nûçeya mirina wî ya reş belav dibe û li wê şevê termê wî dighê bajarê Efrînê.Li roja dî bi dilekî xemgîn û bi karwaneke mezin ji meriv , dost û hevalên wî cendeka nemirê me yê dilsoz û mezin , bi girî û şîn di nav bajarê Efrînê re hate derbaskirin û berê wî dane cîzayîna wî gundê Memila ya ku pir jê hezdikir û di goristana gund de hate veşartin .Rêweresma mirina nemirê me di bin mij û baranê de , di gel gotinek devkî bi navê partiya wî û gotina mabata wî bi dawî bû .

## Gotina Malbatê

**Xwîşk û birayên hêja ..**

Mala we hezar carî ava , wekî ku di bin vê sermê de ,we qedra bavê me yê dilovanî Îbrahîm Zîbar û malbata wî girt , û bi darebesta cenaza wî re hatin mezelê gundê Me'imila . Em ji dilekî xemgîn de we sipas dikin , û dibêjin hatin û beşdarbûna we li ba me cihê serbilindî û dilrehetiyê ye .

Win bi hatina xwe , dilsozî û wefadariyê ji mirovên xwe yên zana û xebatkar re xuya dikin , û piştgiriya xebata ji bo wekhevî û dadmendiyê dikin .

Em bi we û bi xebata bavê xwe û xebata mirovên mîna wî ku ji gelê xwe hezdikin , rêz û silavê digrin .

Em bi navê malbata Zîbar, li gundê Me'mila û li her cihekî , sipasiya dost , heval , gundiyên me , beşdarên bi rûmet û hezkiriyên bavê xwe dikin .

Bila serê me hemiyan sax be , û dilovaniya Xwedê li miriyên we hemiyan be .

Sipas

www.arsivakurdi.org

# Firotina endaman.. Rûdawa kirêt

**Bijîjkê Newrozê**

Nûrî, mirovekî di salên xwe yên sihî de ye, bavê çar zarokan e, li bajarê Efrînê rûdine û di saziyeke dewletê de karmend e.

Wek dibêje, ji ber ku rewşa wî ya aborî xirab e, dêndar li deriyê wî didin, û "rizqekî" ku jê re were jî tune ye, wî serê xwe rakir çû bajarê Helebê, li hin nexaşxan gerî û dilxwaziya firotina gurçikeke xwe pêşneyar kir.

Bêguman kesên nexawş û dewlemend ku kanin gurçikan û belkî Nûrî bi xwe jî bikirin hene, û her dem li benda kesên wilo ne… Ew kesên dewlemend bi hêsanî kanin 750 hezar L.S wekî ku gurçikek Nûrî hat bazarkirin bidin, û wî bi gurçikekê li zaroyên wî vegerînin, û hêrsa Fayîzciyên "bi wijdan û mafdar!!" jî dînin. Hîn di programa Nûrî de ye ku bi wan peran xaniyekî ji zarokên xwe re bikire. Bi rastî, dê çêtir ba eger di govdeyê Nûrî hemî mirovên xwedî "rizqê kêm" de sê -çar gurçik û çar pênc kezeb… hebana; Lê dîsa mala Xwedê ava, wekî ku wî hin endamên guvdeyê mirov çêwî çêkirine, nexwe mirovên wek Nûrî, dê mîna bapîrkên xwe yên destpêkî li şikeftan û li çol û baniyan vegeriyana;

Ji hêla din ve, erê bazara reş a firotina Endaman li Sûryê tê dîtin, lê bi rastî ew rûdaw li ba kesên Kurd û ji navça Efrînê tiştekî pir nûye û cihê lixwesarbûn û hêrsê ye. Rûdawa firotina endamên guvdeyê mirovê sax ji bo bicihanîna pêdviyên jiyanê, tiştekî pir kirêt û hîç ne mirovane ye, tu zagon û destûr, li hundir Sûryê û li derve jî rê nadin û wê qedexe dikin.

Lê mixabin mirov çiqas bibase û li dijî wê rûdawê bisekine, nikane rê li ber bibire û dê her gav hebe. Çinkî sedemên bingehîn jê re hene, divê em lê bigerin, nas bikin, û ji wan ve dest bi çareserkirina pirsa firotina endaman bikin.

Bi kurtî, em kanin sedemên bingehîn wiha bijmêrin:

**1.** Rewşa aborî ya xirab ku qada rêncber ji ber dinale. Di wê rewşê de hin kesên perîşan dê her dem ji bazara endaman re amade bin, li bervajî wê rastiyê jî rastiyeke din heye, ew jî mirovê dewlemend ne tenê endamên guvdeyê xwe nafroşe û nabaxişîne tu kesî, belkî ew wek baxşandin jî ji zaro û malbata xwe re qebûl neke.

**2**. Nezanî: Mirovê nezan amade ye ku endamên guvdeyê xwe bifroşe. Kesên wilo her gav nêçîra bêhêvîtiyê ne, ew bawer nakin ku her mirovek kane gelek karan bike, û rewşa xwe ya jiyandinê jî berepêş û baştir bike.

**3**. Zagonek ji bo baxşandina endaman li Sûryê nîne, ji bilî ku baxşandina endaman bi xwe jî li ba xelkê Rojhilata Navîn nebûye çand û baweriyeke resen. Ji bo çespandina wê çandê, rola rêberên olan û alavên ragihandinê gelek giring e. Ji bilî ku zagonek jî ji bo durustkirina baxşandina endamanên kesên ku li ber mirinê ne zor pêwîst û pir gerek e. Çinkî di sersiya wê zagonê de, her kesek kane weseka xwe bike û li ber mirinê endamên xwe bêpere yan jî bi peran bide panga parastina endaman. Wê hîngê, dê netê bîra tu "Nûrî-yan", endamên govdê xwe bifroşin û xwe têxin bin buvehî û metirsiyên giran.



www.arsivakurdi.org

# Nama Gabrêl Garsya Markîz

**Wergêr:Awazê Kalo**

***Gabrêl Garsya Markîz romanivîsê Emrîka ya latînî yê herî navdar e. Ji ber nexweaşiya xwe ji ronahiyê û qerebalixa jiyanê vekişand nav siyan û nivînan. Û ev hevokên zêrîn wek nameya dawî ji heval û dostên xwe re nivîsand û bi rê kir. Ji ber girîngiya wê, me ji xwendevanên kurd re wergerand .***

- Heger Xwedê ji bîrbike ku ez lîstikekim û jiyanek din bide min, ezê tiştekî li arê nedim. Dibe ku hemo tiştê ez pê diponijim ez nebêjim, lê misogere her tiştê ku dixwezim bêjim ezê pê biponijim**.**
- Ezê bihayê her tiştekî li gor mebest û nirxê wî yê rasteqîn pêdim
- Ezê hindik xewkim û pir xewnan bibînim, ji ber ku her me çavên xwe danhev şêst çirtikan(saniye) ji roniyê em wendadikin.
- fêrbûm Gava xelk radiweste ezê bimeşim gava xelk dikeve razanê ezê şiyarbim
- Ger Xwedêyê min bixweze jiyanek din bide min ezê ciline sivik li xwe kim û li ser xakê xwe dirêjkim, ne tenê gewde taz, lê belê giyan tazî jî !!
- Ezê ji xelkê re vuyabikim, ku pirî û evînî ne li dij hev in û mirov kal dibe gava ji evînê bi dûr dikeve.
- Ezê basikan bidim zarokan, lê ezê wan bihêlim ku bi xwe fêrî firê bibin .
- Ezê yên navsal fêr bikim, ku mirin bi jibîrbûnê re tê; ne bi kalbûnê re.
- Ez gelek fêrbûm ji we ey mirovino? Ez fêrbûm ku herkes dixweze li serê çiya bijî, bê ku zanibe ku raza şahiyê di hilkişandinê de ye.
- Ez fêrbûm ku zarokê nubûyî cara yekem ku tiliya bavê diguvişe ta dawiyê pê digre.
- Mafê mirov heye ji jor ve li yekî din binêre, tenê gava pêdivya alîkariyê pê hebe, ku yê din rabe ser xwe.
-Herdem tiştê ku tu pê hestdibî bêje û tiştê tu pê diramî bike.
-Ger min zanîba ku ev cara dawiye, ku te tê de dibînim, minê bi hêz tu hembêzkira û ezê li ber Xewdê bigeryama ku min bike parêzvanê giyanê te .
- Ger min zanîba ku ev xulekên(deqeyên) dawîne ku te tê de dibînim, minê bigota: Ez ji te hezdikim, û minê xwe bikira ku ez nizanim tu vê yekê baş dizanî.
- Siba heroj heye û jiyan keysê dide ku em her tiştê baştirîn bikin, lê ger ez şaşbim û ev roja min a dawî be dixwezim ji te re bêjim çendî ji te hezdikim û bi carekê te ji bîrnakim.
- Ji ber ku, siba ji kesî re ne misoger e, ne ji ciwan û kalan re, loma dereng memîne, dibe ku carek din tu yên jê hezdikî nebîne û siba belkî neyê, tu yê poşman bibî, gava keysek tune be ji bo kenekî maçekê hembêzkirinekê an hêviyekê ji dilyarên xwe re bişîne.
- Hezker û dostên xwe bizavkin ji xwe dûr mexînin, di diguhên wan de bêje, ku tu hewcedarî wane guh bide wan û ji wan hez bike, herdem hevokên wek ez te fêmdikim min bibore ji kerema xwe spasî bila li ser zimanê te bin.
- Kes te bi bîra xwe nîne, ji ber ramanên veşartî di serê te de ji Xewdê hêz û hişmendiyê bixweze ku tu wan eşkere û ronî bikî.

**Dumahîk: 15ê Gulanê**

- Li qenalên tilfizyonên kurdî temaşe bikin.
Guhdarî stran û mûzîka kurdî bikin.
-Em bawer in, ku mirovên me yên bi qîret, kanin bi van çend tiştên biçûk û pir giring rabin, û kanin tiştên ji wan mezintir û giringtir jî ji bona zimanê xwe bikin.

Belê.. Parastina zimanê me erk, dilsozî û stubariyeke netewî ye. Pir giring û gerek e, ku em li zimanê xwe û cejna wê xwedî derkevin, da wê cejnê di jiyana gelê me de, bikin boneyeke jîndar

Cejna zimanê kurdî li her mirovekî Kurd pîroz be.

**Komîta rêvebir Ya S.F.P.Z.Ks**

www.arsivakurdi.org

# Çima Ziman Pêwist e ?

**Dilovanê Deştê**

Ji hebûn û berdewamiya jiyana gelan re, ziman yek ji hêmanên bingehîn e û ji ber vê yekê jî, zimanhez û zimanzan, bi giranî û bi rengekî zanistî, li ser şirovekirin û danasîna ziman rawestan e. Wan ziman wekû yek ji hêmanên bingehîn yên avakirina netewan dane nasîn. Ziman ne tenê gringtirîn hêman e, lê belê ew bi xwe hebûna netewan e. Ji bo ev bê nasîn, pêdiviye ku em zanibin ziman çi ye , û kengî tê pêkanîn.?

Ziman, wekû zimanzanan daye nasîn, alava peywendî û têkiliyê ye. Bi zimên, mirov dikare hest û ramanên xwe bigihîne herkesî, her wiha jî, ew bîr, raman û bîranînên mirov ji windabûnê diparêze. Bi vî awayî ziman, ji aliyekî ve, ji bo parastina kelepûr û kevnetor kewar e ,. û ji aliyekî din ve, ew nasnameya netewan ji windabûn û têkçûnê diparêze. Lê, li hemberî vê jî, windakirina ziman, windakirina mafên mirov e. Çunkî ew mafên ne bi zimanê xwediyên xwe bêne xwestin û daxwazkirin, qet nayên bi destxistin û ew winda dibin.


Hêjayî gotinê ye ku her zimanek nîşana hebûna neteweyekî ye û çand û wêjeya wî nîşan dide û diparêze, ango: Milet bêziman nîne û ziman jî bê milet nîne. Bêguman, wêje yek ji alavên avakirina mirovan û sazkirin û dûzkirina rewşa civakan e. Lê pir pêwîste em zanibin ku hebûna wêjeyeke xurt û pêşketî bi hebûna gotinên xweş û rastgo ve girêdayî ye, yên girêdana wan bi hev ve li gorî rêzik û bendên rêzimaneke bi rêk û pêk tê pêkanîn e. Wêjeyeke wisa wê pir giranbûha û bi rûmet be û wê di pêşxistina gelan de xwedî rol û bandoreke xurt be.

Bêguman, neyarên rastiyê û peyva azad têgiha ne, ku çand û wêje, di jiyana gelan de roleke sereke dilîze, lê ji qaftengî û nezaniya xwe, ew hewl didin ku ji bilî zimanê xwe pê ve tu zimanên din jîndar nebînin. Ew ji bîr dikin ku, ev kar karekî nemirovane ye, tenê di yasaya daristanê de cî digre. Ji ber wilo jî, ew qanûn û yaseyên awarte, li gorî nijadperestiya xwe, bi zanebûn dihûnin û ji bo qedexekirina zimanên din dixebitin. Rast e, ew nikarin zimên bikujin û ji rakin, lê belê riyeke tenê jê re vekirî holê dimîne, ew jî riya vejîn û xweparastinê ye. Lê, çendî ew zimanê me qedexe bikin, rêl û keleman di riya pêşketina wî de biçînin jî, çiqasî û biqurmiçînin, ewê ji nû ve kat bide, bibe qurs û bejna xwe bilind bike. Di baweriya min de, girînge em baş vê rastiyê zanibin û em bi zimanê xwe yê mak bixwînin, binivîsin û biramin. Pir pêwist e ku, em bi zimanê xwe rabin, rûnin, bixwin, bipeyîvin, kar bikin, bikenin û bigirîn, ... . Lê em bi hemî zimanên cîhanê re aştîxwaz û demokrat bin.

************************************

## Helbestvanê Kurd ê navdar Mele Nûriyê Hesarî jî ji nav me bar kir

Roja Şêşembê 25.01.2011anZ, helbestvan û zimanzanê Kurd ê navdar seydayê **Mele Nûriyê Hesarî** li bajarê Ç bi temenê 77 salî çû ber dilovaniya xwedê. Bi beşdariya birek ji rewşenbîr, welaparêz, hezkerên zimanê Kurdî û nûnerên tevgera welaparêz a Kurd li Sûriyê, di mzelê Qidûr Begê de cendekê wî yê pîroz hate veşartin.



Seydayê mele Nûrî, ji helbestvanên kilasîk e, hevriyê seydayê Cegerxwîn, mele Ehmedê Palo, mele Ehmedê Namî û seydayê Tîrêj e. Wî helbstên xwe bi zimanekî kurdî ferhengî ristine. Dilê wî yê mezin bi evîna welêt hatiye daxdan û birîn bûye, bi fîxan û bi nalîn li ser derdê gel û welatê xwe Kurdistan rondik barandine.

Du dîwanên wî yên helbestê hatine çapkirin û gelek destnivîs li şûn xwe hiştine.

Bila serê malbata wî, hezkerên wî û rewşenbîrên Kurdî sax be.

Xwedê wî bibexşîne û cihê wî buhuşta rengîn be!


www.arsivakurdi.org

# Bi serbilindî, Te rêz û hezkirina gelê xwe wergirt

**Bavê Helebçe**

Di nava rojên cihanê de, gelek rojên giranbuha û girîng hene, di wan de, şahî û xemgînî tevlî hev dibin û dikevin dîroka gelan.

Roja 18-10-2010 an jî, di dîroka gelê Kurd li Sûryê de rojeke taybet e. Di vê rojê de, keskesor di bejn û bala lehengê nemir, payebilindê bi rûmet SIMAYIL EMO de der bû.



Sûriyê bi tevayî, bi Kurd , Ereb, Asûr û Ermenên xwe ve, bi koçkiririna wî xemgîn bûn.

Rewşenbîr û hunarmend, siyasetmedar û civaknas li seranserî welêt û li derve, li berdewamiya 40 rojî hedanî nekete pel, pênûs û malperan, bi xemgînî û hestên şikestî bersiva xatirxwestina dawî ji welatparêz û hezkerê mirovatiyê BAVÊ ŞIYAR didan. Ji wê dema ku SÎPAN ê min, biçûkê xwişk û biran, hawar û gaziya xwe gihande min, ez pepûk û rebenê Xwedê, per û baskên min şikestine, tevzînok û tayên sar û gerim ez girtime, temara mirinê ketiye çavên min. Heyyyyy heyy mirina parsûxwar a bêbext û bê oool, heyyy feleka bextreş û xapînok we xwe li me kir yek û vê carê we li serî da, erêêêêê aniha ez bêçek im, bêhêz im, baskên min şikestî ne!!.

Bûyer pir mezin e, ji min û pel û pênûsê mestir e, pişta çiyayê Cûdî pişta di bin bar de xwîz dibe, mesîl û newalên Dicle û Ferêt têra histêrên çavên min nakin!..Lê ez SIPANê xwe bi tenê nahêlim, ezê vê pênûsa xwe ya çavreş di gurçika mirinê de biçikînim, xencer û ekfiya xwe ya kurmancî di kezeba feleka rûreş de biçikînim.. Ez çi bikim, ji berê ve gotine mûma geş zû vedimire û temenê gula ciwan jî kurt e. Pend û banga te ji gelê te re hertim ev bû: *"Eger hûn dixwazin dilê min di gorê de vehese û hêsa be, ji hev hez bikin rêzên xwe bikin yek, dest û milên xwe bidin hev û bi heşmendî ji bo doza xwe ya dadmend û rewa kar û xebatê bikin"*.

Rihet be serokê min, bila baweriya te bi gel û hevalên te bilind be ku ewê ra dawiyê rêça te bişopînin, ew jî mîna te wê hemî şêweyên kar û xebata aştiyane bi kar bînin û ji bo parastina nasnameya gelê xwe, wê qehremanî, disozî û welatparêziya te ji xwe re bikin nimûne û pirtûkeke pîroz, da ku rê li pêşiya wan dûz û ronî bike.

Li vê jînê, gelek zindî bê rewan in, lê çendekê nemiran hîn serkêş in, bi kerwan in.

Tucarî tu ji dil dernakevî, her û her tu serok û rêberê minî. Xweska ez karibim te di bin zimanê xwe de bimeyînim. Xweska ez karibim te di landika zarokên Helebçe de bi lorînim. Xweska ez karibim te di reşikên çavên xwe de veşêrim, da ku bi mijangên çavan te ji germ û seqema xuristê biparêzim ey heval. Lê,tenê ez karim eniya xwe li ber bejna te ta bi kabokan bitewînim.

Serokê min. Min nizanîbû ezê ewqasî bêriya goristana gundê Qereqoya xopan bikim, lê her êvara pêncşebmê, çavnêriya min bike ez bêm serdana gora te, hêêdî hêêdî, bi nazikî wan kêstekê dora gora te biguvêşim ta dengê nalîna dilê min û ahîna kesrên bêrîkirinê bên guhên te, tu xwe bi wan mijûl bike ta pêncşembeke din ezê bêm.

Serokê min bera hemî gulên vî welatî ji bo te bikin dîlan, tenê gulek ji rengê xwîna te bibe bawername, da ku di rojên pîroz, rojên cejn û şahiyan de, keç û xortên me gerdenên xwe pê bixemilînin, û heger rojekê buhar bi ser welatê me de bê, emê rahêjin gurzên gulan bên ser gora te û tev bi hev re sirûda azadiyê di guhê te de bixwînin û bistirên.

Rihet be serokê min, qehremanî, dilsozî, mirovatî û welatparêzî tev bi navê te dest pê dike. Tu payebilind hatî jiyanê û payebilind û bi rûmet te jê barkir!!.

Cihê te buhuşta rengîn be, mêvanê Berzanî Qazî, Zaza û Şêxseîd be.

www.arsivakurdi.org

# Roja cîhanî ya zimanê dê

**Selah Beyro**

***Li*** gel destpêka guhartinên siyasî yên dijwar ku, li welatên erebî têne rûdan û rijêmên wanî regezperist têne têkdan û ruxandin,nemaze li wê dema ku em pêşwaziya hilkefta roja cejna cîhanî ya zimanê dê dikin ya ji bal kongirê rêxstina Al yûnsko giştî ve li rêkeftî 17.11.1999. ê hatî li darxistin,ragehandibû ku ji sala 2000.z pêde her sal /21/sibatê Mîna cejna zimanê dê li cîhanê tê destnîşan kirin û pejrandin,ew jî ji bo besendkirina çandên heme cor ,û pir zimanî li cîhanê ,ev zimanê ku bihtir ji /7000/ netew û kêm endam li ser vê xakê pê di peyivin,û li gor agahiyên zanyarên ziman wê ev rêje ya zimanan kêm tir bibe ji encamê teknolociya serdem ,bi hatina nifşên nuh re li paşerojê. Li vê serdemê pir guhertinên lazgîn li ser hemî astan hatine rûdan û bikaranîn bi binesaziya rêzgirtina hemecora ziman zanî û çandeyî û hevçerxî û siyasî,li welatên dîmukrasî û hevçerx yek reng û yek çand û yek boçûn nayê pejrandin li vî çerxî û tu paşeroj jêre nîne li dema diyar kirî de, lê mixabin rijêmên kurdistan dagirkirin mefa ji van guhertinên lazgîn ta nuha ne wergirin,û baweriya wan bi netewên heme cor nayê,û ev rijêm ji yek reng û yek çand û yek derbirînê pê ve na pejirênê, lew ra bi dihan ziman zan û helbestvan û nivîskarên kurdistanî ji bal wan ve têne girtin û bin Çav kirin. Banga min ji gelê kurd re ku gotina Mîr Celadet Bedir Xan li bîra xwe bînin ya li sala1941ê di hijmara/27/ê hewarêde gotibû: " Malxerabo ! ma we ew çend wext nîne hon ko ji bo hînbûna zimanên biyaniyan bi salan ve xebitîne îro jî dixebitin ji bona ko bikarin "fînfoneke" derewîn bi lêv bikin
Kuro .. Keçê
Eybe..şerme..fehite, an hînî zimanê xwe bibin an mebêjin em Kurd in bê ziman Kurdîtî ji we re ne tu rûmete ji me re rûreşîk giran e
Heyf û xebînet û hezar mixabin nemaze ji wan re ko bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsînin û elfabeya zimanê xwe hêj nas nakin " Bêgoman pir partiyên siyasî û kurdperwer di van kawdanên aloz da aloz da nifşê nuh fêrî zimanê zik makî(dê)dikin,ew jî cihê rêzgirtinê ne,pêwîste ev roj bibe helkeftek ku hemî gelê kurd bizmanê xwe yê zikmakî şêrîn bixwînê û bi xwendin bide. Bijî roja cejna zimanê cîhanî.

***Ji malpera Welatê me***

**************************************

**Ednan dilbirîn**

**A.Tislorî**

Hunermendê ciwan, Ednan dilbirîn, li gundê Dêrsiwanê – herêma Efrînê ji dayîk bû.Ew di sal 1957 an de, evînperweriyeke xurt , deng xweş , zelal û nefes dirêj bû.Wî pir bi coş stiranên xwe pêşkêşî cemawer dikirin . Di sala 1980 ê de, çû bajarê Helebê û dest bi huneriyê kir , û pir gotin û awazên sitranên xwe bi xwe çêkirin .Ednanê Mûsê "7" kasêt belav kirin û ciyên pesnê bûn ,wek Sewda û Efrîn .Pênc zarok wî du xort û sê keç çêbûn . Dilbirîn, navê wî yê hunerî ye .Ew çû Almaniya û li wir 2 aheng çêkirin û ciyê kêfxweşiya gelê Kurd li wir bû . Pir caran li cejna Newrozê , wî stiran gotin . Stirana wî ya bi nav û deng Gula nisrînê bû. Herweha li pir ahengên sersalê distira û dilê guhdaran xweş dikir . Kasêta wî ya dawiyê bi navê Înanke bû .

Qedera wî hunermendî ciwan, ku li ser riya gundê Kefercenê û Helebê bi qeza otombîlê here ser dilovaniya Xwedê . Temenê wî "42" sal bûn .

Gava termê wî rakirine , gelê Kurd pir vêre bi rê ketin û li nav bajarokê Efrînê gerandin û li pêşiya havîngeha ( Elselam ) hunermendê mezin Elî Tico gotinek bi êş li ser wî got. Ednan dilbirîn kurdekî pak bû ,ciyê rêz û hurmetiyê bû , welat hez bû û hunermendekî ciwan bû, lê ,mixabin qedera wî wilo bû. Bila ciyê wî buhuşt be .

www.arsivakurdi.org

## Koleyê Aqilmend

**Hesenê Cumî**

Rojekê Mîrekî ji bajêr koleyê herî nirxbiha û aqilmend, kirî . daku aqilmendiya wî nasbike, jê pirsî : Koleyê min! Ev hespê min yê boz resene an na?.

Kole got: Mîrî min ê hêja tuyê sê rojan bidî min, daku karinim bersiva te bidim. Piştî sê rojan kole vegerî û got : Mîrê min, ev hespê te bi çêlekan re jiya ye. Mîr xwediyê hêsp anî û jê pirsî: Ka ya rast ji min re bêje. Hespfiroş got:.Mîrê min, ya rast di çûkaniya wî de, dê dimer û ew bi şîrê çêlekan xwedî dibe.

Mîr ji kole pirsî: Te çawa zinî ev ne rsen e?.

Kole got: Mîrê min, gava hesp avê vedixe dike qorteqort û yek car avê vedixe, lê çêlek di ber lêv û diranên xwe re avê diweşîne.

Mîr got : ka nanekî zêde bidin kole.

Roja dî mîr ji kole pirsî: Ka vê carê ji min re bêje: Ev bazê min resen an na?. Kole dîsa got: Mîrê min ê hêja tuyê sê rojan bidî min daku karibim bersiva te bidim. Piştî sê rojan, kole vegerî û got : Mîrê min, ev bazê te bi mirîşkan re xwedî bûye. Mîr ji xwediyê baz pirsî .Mîrê min ya rast, ev baz li nav mirşîkan xwedî bûye. Mîr ji kole pisrî : Te çawa ev yeka zanî?. Kole got: Mîrê min ê delal, baz bi nikilê xwe goşt ji laşê nêçîriya xwe diqetîne, lê mirîşk , niklê xwe di erdê dide daku xwerina xwe qetqetî bike. Mîr got: Manekî din zêde bidin kole.

Mîr dîsa ji kole pirsî û got: Koleyê min, sê roj ji te re , daku tu ji min re bêjî, ez ji pişta bavê xwe me an na?.

Kole yekcar got : Mîrê min bersiva te amedeye, tu kurê nanfiroşî. Mîr agir dada û diya xwe bir ber êgir û got: Ka ji min re bêje kî bavê min e?. Dê got: Kurê min rûyê min ji reş e, zarok ji bavê te nedibûn, ji bo paristina payêtexa bavê te , ez şevekê bi nanviroş re raketim.

Mîr ji kole pirsî: Çawa te ev jî zanî?. Kole got :Ev ji ber camêriya te ye.

***Bûyerek rast***

## Keça Mamoste

**Cotyarê Cûmê**

Dibêjin mirov di welatê xwe de dibe biyanî . Ma ev gotin ta kîjan radeyê di cî de ye?! . Ji deşta cûmê , herêma Efrînê , Rojîna biçûk tevî malbata xwe bardikin bajarê Helebê . Ew li wir mezin dibe . Lê , hertim kuç , kastîn û wêneyên pir tiştên gund û zarokatiya wê di bîra wê de dimînin û di berçavan re derin û tên û girêdana wê bi gund ve bi hêztir dikin . Piştî demekê xwendina xwe , beşê mamostetiyê bi dawî tîne , bi hêviya ku li herêma Efrînê bibe mamoste û nifşên nû fêr bike . Dema ku belgeya bicîkirina xwe werdigre , ji kêfa re difire û bi lez vedike û dixwîne . Ew têdighe , ku li dibistana gundê ( El Muzeyenê ) , li herêma Efrînê bi cî bûye . Gelek şadibe , lê , li ber navê gund disekine û dibêje : Gelo gundê Muzeyenê li kû dikeve ….!? . Paşê dîsa ji xwe re dibêje: Xwedî û merivên min, wê ji min re bibêjin . Lê , mixabin tu kes ji heval û nasên wê jî nizanin li kû ye . Di dû re , xwe hildigre û dere gundê xwe û li ba mala mirovekî wê , merivên wê lê dicivin , dîsa jî tu kes nizane . Lê dibêjin: Ger hebe ev ne navê gund ê resen e û xuya ye ku navekî hatiye te'irîbkirin e . Piştî gelek lêpirsînan , derdikeve , ku gundek ji gundên bajaroka " Şiyê " ye .

Di şevbuhêrkek ji şevbuhêrkên xwedî û merivên Rojînê de , ku axaftina wan li ser guhertina navên gund û bajarên Kurdan bû , li wir Rojîn têgihîşt û ji civatê re got : A weha mirov di welatê xwe de , xwe biyanî dibîne û dijî

www.arsivakurdi.org

# TRT6 Kûve diçe!?.

**Enehîte Murad**

***Li*** vê dawiyê û ji berî du salan ve, rejîma Tirkiyê piştî biryara xwe bi vekirina kanala TRT6 wergirtibû . Li pêş raya giştî ya der û hundir nemaze ya Kurd , wê aşkere dikir û digot : Ev kanala ji bo xizmeta hemwelatiyên Kurd ên Tirkiyê ye ! Ta ku ew bi hesanî karibin huner û zimanê xwe vejînin û geş bikin . Wisan jî , birek ji Kurdan didîtin ku, ev yeka li ser riya demokirasî û mafên mirovane gaveke berçav û bêlîkirî ye.

Ew rikgirî, setem, cudahî û zordariya ku, ji evqas sal ve ,ya desthilatdarên Turkan û yek li dû yên dî li serê Kurdên rojnedîtî dimeşînin, yê bêgûman û di paşerojê de ji ser Kurdan rabibe ?!. Hîngê heyameke demoqratîk yê di hundir dewleta Tirkiyê de cî bigire !?.

Lê, pir zor mixabin, piştî demeke kurt rejîma Tirk bê şerm û fedî dijîtî û çavsoriya xwe, di dermafê zimanê Kurdî de aşkere dikirin ! Roj ji rojê, bihna tirkçîtiyê ,ya teng û kufikî ji TRT6 hildikele, çavtengî li Kurd û zimanê wan yê şêrî aşkere dibe, nemaze ji nifşên nûguha re baş diyardibe. Û herweha ew îro bûye piropagendeya rejîma Tirkiyê û bi rengekî fermî fermana qedexekirina hin gotinên kurdî didan û didin. Li gora agihiyan , TRT6, birek ji peyv û gotinên kurdî yên resen qedexe û herqedexe dike. Evên jêrîn gurzek ji wan gotinên qedexekirîne: ***Aram, arîşe, artêş ,asayî , asteng , belavok , bûyer , çalakî dadgeh , damezrandin , darayî , dîmen , dîrok , dozger , ewleyî , ewlekarî , erdnîgarî , êrîş , fermî , gerdûn , girîng , helwest, hîndekar , komar , kovar , maf , merc , mijar , nakokî , navnetewî , netewe , nexşe, nijad , nûjen , parêzger , pejirandin , perwerde , pîşesazî , pêşkêş , pêvajo , bijîşk , raman , raya gel , rexne rêxistin , rizgarî , şano , şaredarî , taybet , têkoşîn, tenduristî, wêje , qedexe, zanîngeh, zanyarî , Kurdistan , miletê kurd***, û H .W.D

Ma gelo! Çima rejîma Tirk ji ya xwe namîne û herdem armanca xwe , bi pêlwazî û derewan hawil dide û dike, bi hesanî xwe di ser pirsgirêka doza gelê Kurd re davêje û wê bincil dike ! Heyif û mixabin ku rejîma Tirk , li pêş raya gişî, di pirsgirêka Felestîn-Îsraîl,û Sûriyê de xwe mîna kesên xêrxwez nîşan dide û pir pêwîste ku ala aşîtî ,wekihevî û demiqursiyê di rojhilata navîn de, bi destên rejîma Tirk were hildan , qet ew nizane ku bi vê awî xwe di rûpelên dîrokê de nemaze li pêş nifşên nûguha rûreş û şermezar dike ..

**************************************

## Pêpsiyan Hertim vexwin!?.

Pêpsî vexwerineke mêr ,jin û zarok tev jê hezdikin û li malan tim tê dîti. Nabe mîvanek were çi malê û pêpsî venexe ! . Birastî ,di nav xelkê me de, ew vexwerineke bingehî ye .Tucar kes ne pirsî ye, pêpsî sûdar e an na!.

Erê rengê şûşê sipî ye , bi qabê hişîn e , li ser aşkere xuyakirine , pêpsiya me ji çi çê bûye wek : Şekir ,rengê keremêlê ,madak tirş û kefeyînê ye , ji çend heyvan ve çê bû ye û piştî çend heyvan têkdiçe . ?

Rengê wê reş e ,mirov dibêjin gelek xweş e . Tiştê li ser nûgihan pir akam û bendor dike û wê pir bi lez dikirin û xweş-xweş vedixin . Wê wêneya fantaz a li ser şuşê û wê peyvên li bin wê tên nivîsandin , pir stranbêjên ku xortên nûgiha jê hezdikin , pirpegandên têvel ji bo wê vexwerinê çê dikin û wê bi mirovan xweş dikin ne wilo !? . Qet ew nizanin ew tun vexwerina ,çiqas zirar bi canê mirovan dike :Hestiyan dihelîne , diranan qul dike ,zikê zarokan sancî dike .. .H.W.D

Wekî mezinên me gotibûn: Ne hertiştek vexwerinê ,yan jî xwerinê xweş be ,sûdan li canê mirovan dike, we got çi?.

www.arsivakurdi.org

# 15ê Gulanê
# Cejna zimanê kurdî

Di encama şerê cihanê yê yekê de, dewletine nû li Rojhilata navîn hatin damezrandin, û gelê Kurd û welatê wî jî li ser çend dewletan ji wan hatin parvekirin.

Piştî ku heyama siyasî li Rojhilata navîn rawestî, û sînorên navdewletî yên nû hatin çespandin, ew dewletên ku Kurdistan li ser wan hati bû parvekirin, siyasetên tunekirinê di tenga gelê Kurd re ajotin.

Wan li destpêkê dest avêtin zimanê kurdî, û xwendin ,nivîsandin û dengkirina bi kurdî jî qedexe kirin, û herweha, hebûna zimanê kurdî û gelê Kurd bi xwe jî ketin tirsdariyeke rastîn.

Mixabin, ew helwest û siyasetên li dijî şaristanî û mirovatiyê, ra dema niha û bi şêweyên birêkûpêk tên meşandin, û zimanê kurdî û gelê Kurd jî hîn di rewşên ne azad de ne.

Di ew rewşên kambax û dijwar de, gelê Kurd û lawên wî yên zana û dilsoz, herdem û ta roja îro berxwe didin. Yek ji lehengên herî gewre di warê zanîna zimên û çanda Kurdî de, Mîr Celadet Bedirxan bû.

Mîrê gewre Celadet Bedirxan, li destpêka salên sihî ji sedsala bîstan Abeya kurdî ya latînî danî û kovara HAWARÊ pê weşand. Wî bi ew karê xwe yê pîroz ,şoreşeke rastîn di warê zimên û çanda kurdî de rakir.

Hejmara yekê ji kovara Hawarê di roja 15ê meha Gulanê ya sala 1932an de ronî dît. Loma jî , roja derçûna wê di jiyan û vejîna zimanê kurdî de, rojeke pir naskirî û zor pîroz e.

Lê, mîna ku em dizanin, ew şoreşa ku Mîr Celadet di warê vejîna zimanê kurdî de dabû destpêkirin, hîn bi dawî nebûye. Ji ber ku hîn tunekirina zimanê kurdî di navika nîşana neyaran de ye, û bi tundî dijîtiya hebûna wê tê kirin.

Loma jî, li sala 2006an, hin rêxistinên netewî û saziyên rewşenbîrî li Bakurê Kurdistanê, roja derçûna kovara Hawarê, ango roja 15ê meha Gulanê, wek "Cejna zimanê kurdî" ragihandin, û ji sala 2009an de, li sê rojan (14-15-16ê Gulanê) çalakiyên taybet di warê vejîna zimanê kurdî de li dar dixin.

Saziya me jî, "Saziya parastin û fêrkirina zimanê kurdî li Sûriyê", biryar da, ku piştgiriya wê pêşinyarê bike, rojên (14-15-16ê) ji heyva Gulanê mîna cejna zimanê kurdî bipejrîne, û li gor rewş û derfetan, kar û çalakiyên taybet di ber parastin û geşkirina zimanê me de bike.

Li gor heyam û rewşên tevahî, ku roja îro li Sûriyê hene - mîna qedexekirina hemî çalakiyên Kurdeweriyê jê re navnîşan e - dîsa jî, her mirovek û maleke Kurd, kane di hersê rojên "Cejna zimanê kurdî" de bi gelek karên giring di warê hezkirina zimanê xwe de rabe.

Banga me ji her mirovekî Kurd re, ku em bi hev re zimanê xwe biparêzin, bikaranîna wê bikin erk û li hebûna wê xwedî derkevin.

Ji bo pêkanîna cejna zimanê me- wek mînak- em van kar û stubariyan ji her kurdekî re pêşniyar dikin:

* Nameyên piştgirî û pîrozkirinê di riya SMSan re, bi boneya Cejna zimanê kurdî ji hev re bişînin.
* û sûdar. Di hersê rojên cejnê de, biçûk û mezin, jin û mêr, û hemî endamên malên Kurdan -ku zimanekî din jî di mal de bi kar tînin- tenê bi kurdî baxivin, û bi kar wînin.
* Biçûk û mezin xwe fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bikin, û çîrok û nivîsên kurdî di malan de werin xwendin.
* Têbîn, tiştên xwe yên taybet, nav û nimreyên telefûnan, çi di defteran û çi di mobaylan de, bi kurdî binivîsin. **D.R (4 )**

www.arsivakurdi.org

## Dumahîk: Guhartinên mezin

Zarzimanê wan di riya dezgehên wan ên raghandinî yên rengîn û pir alî re , bi herhawî dikin ku rûyê hêz û kesayetiyên nerazî û rikebir reş derîne û bêje – xwedê giravî – ev xwepêşandan , çi li vir û çi li wir , karê nokerên hêz û dewletên biyanî ye …. !. Lê , bûyerên heyî , rastiyên berçav digel gelek rapor , dîmen û wêneyan , didine xuyakirin ku , ew hêz û cemawerên xwepêşandanan , ne ajan û noker in , nejî şêt û bêhiş in , an terorîst û xwînrêj in … Ew mirovhez , dilsoz , dilgerim û hişyar in , heyranê miletên xwe ne , xwedî doz û daxwazên dadmend û rewa ne , bi şêweyên aşkere û aştiyane dengê xwe li beramber malxurî û setemkariyê hildidin û dibine ciyê rêzgirtin û hezkirina gelên xwe .

Hêjayî gotinê ye ku , di pêkanîna van çalakî û guhartinan de , xwediyên rola herî li pêş û berçav , nûhatî , xortên zana û nifşên nû ne , ewên dilgerim , sernerim , xwedî hêvî , jîr û jêhatî û bi Entirnêtê baş fêm dikin û karin li destên xwe bigerînin da bi hev re têkildarbin û bibine hêz .

Li hêla dî jî , ew guhartinên mezin , pîroz û serkeftî yên ku li Tûnis û Misirê cîbecî bûne û li cîgehên dî jî dibin , didine zanîn û xuyakirin ku , rewşên hundirî , pirsên xizanî û bêkariyê , pirsa demokrasî , rûmet û mafên mirovan , jêder û bingeha guhartinan ne , û çendî hêz , partî û tevgerên siyasî serbixwe û welatparêz bin , ne li gor siyaset û berjewendiyên derve bin , û biryarên wan hêz û partiyan di destên wan de bin , ewqas , dê serfiraz û serkeftî bin .

Pirsgirêkên welatên Ereb û Rojhilata navîn bi tevahî , Sûriyê jî di nav de , cîbecîkirina alfebeya demokrasiyê , rêzgirtina mafên mirovan , çareserkirina pirsa bêkarî û perîşaniyê ye , pirsa azadiya peyvê û wekheviyê ye .

Di gavavêtin û serkeftina çareserkirina van pirsan de , pirsa gelê Kurd jî ciyê xwe yê rast dê bibîne û çê nabe jê bête cudakirin . Hê jî gelek hene naxwazin bawer bikin, ku dem hatiye guhartin , û bi darê zorê , bi girtin û lêdanê , bi kuştin û xwînrijandinê , bi tang û topan û şerxweziyê , girêk û astengî bêtir dibin , nexweşî , derd û kul , kîn û keder kûrtir dibin , rê li ber aştî û diyalogê dixetime û tê girtin .

**Heleb 22.02.2011**

*** Sekretêrê Parta Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê .** M. Şêx Allî

*********************************

**Dumahîk: Sûriya û Bahoza.**

Ji bilî ew rastiyên tehil, gelek pirs û pirsgirêkên mezin û qeyranbar jî hene, ew jî li dirêjiya dehsalan dimixmixin, û mîna terafa dibin ariyê de ne û destlatê derî li ser kilît kiriye. Wek mînak: Pirsa netewan, pirsgirêkên bineolî, pirsa windabûyan, gendele, dizîna dahatûyên dewletê… û H.W.D. Bêguman, ew pirsina jî radeya tengijîna civakî bilind dikin û heyamên tirsdar û bargiran di demên nêzîk de gengaz dikin.

Di van rewşan de, çavên her mirovekî Sûrî ji hemî nof, netew, ol û qadan li destlatê ne, ew bi hêvî ne ku wê çavên xwe baş vekiribe, li dedora xwe baş dinêre, rewşan baş dixwîne û dinirxîne û dersan jî bi nêrînên erênî û bi welatperwerî jê werbigre.

Ji ber ku ne tenê gelê Sûrî, lê belê dost û dijmin jî dibêjin: Zor pêwîst e ku destlata Sûrî rojekê pêşde dest bi guhertinên bingehîn di hemî warên sazûmanê de bike, li serê wan guhertinan û mîna gaveke destpêk, zagona awarte ku ji pêncî salî ve li dar e, were hilanîn, hemî alavên ragihandinê werin azadkirin û rola dezgehên asayişî jî di rêvebirina dewletê û jiyana mirov de were bendkirin.

www.arsivakurdi.org

# Sûriya û Bahoza Azadiyê!

Rozad Elî

Dihat gotin, ku gelên Ereb li derveyî demê û dîrokê mane, lê roja îro li ber çava ye, çawa tevgerên guhertinê li gelek dewletên Ereb radibin, di encamê de sazûmanên dewletan ji binî ve tên rûxandin, û gel azadiya siyasî bi serfirazî werdigirin.

Ne tenê wilo, ew tevgerên dîrokî û guhêrbar roj bi roj ferehtir dibin û bandorên têvel û mezin li gelek dewletên din jî dikin û gelên Rojhilata Navîn hişyar dikin.

Çima na!? Eger em bala xwe bidinê, emê bibînin pirsgirêkên piraniya dewletên Rojhilata Navîn mîna hev in, mîna ku destlatdar û serokên wan tif devên hev kiribin, ew wek hev difkirin, mîna hev zordariyan dikin qîmetê nadin daxwaz û pêdviyên gelên xwe, her roj û her katê rûmeta mirovên xwe binpê dikin, û ji hev bêtir jî sermiyanên serzemîn û binzemîna welatên xwe didizin.

Ev tiştên paşverû û setembar ku me li jor gotine, ji salixên sazûman û destlatên piraniya dewletên herêma Rjhilata Navîn in, û digel ku genîbûna wan eşkere bûye û bêhna wan derketiye, lê hema qelewîzên xweguhertineke rast jî li ba sazûmanekê serî hilnadin.

Di nava ev bahoza guhertinan de, sazûmana Sûryê jî dê hêmen nemîne. Ji ber ku ew jî ji aliyê gendeleyê û perçiqandina rûmet û mafê mirovan de ji destlatên kevin û navdar e. Çiqas berpirsên destlatê bixwazin rûyekî pak bidin destlata xwe, û rastiyên destlata xwe ya zordar jî veşêrin , carina sond jî bixwin ku rewşên giştî li Sûryê aram û gulvedayî ne, lê ew hîç nikanin royê bi bêjingê bigrin û rastiyên sazûmana xwe ya paşverû û destgiran bincil bikin.

Ji berê ve dibêjin "Rum di tûran de netên veşartin", wek tê zanîn, hemî çavkanî û çavdêrên pispor li der û hundurê Sûryê, mêlag dikin ku rewşa gelê Sûrî ji her aliyekî ve bi aloz û dijwarî bûye. Zanînên rastgo diyar dikin jî ku, dora %40 ji gelê Sûryê daketiye bin asta sêfîliyê, ew jî rastiyeke mezin e, tirsdariyeke giran di hundurê xwe de hildigre û zemîneke lêhatî û îjdil ji bo tevgerên cemawerî yên rikber re peyda dikin.

Dîsa zanîn diyar dikin jî, ku rewşa qada civakê ya naverast, ku ji xudî şihadeyên zanîngehan, hejmara mezin ji karmendên dewletê, bazirgan û pîşeyên biçûk û naverast pêk tê, ew jî digazin, rewşa wan jî ne durust e, ew jî dibin metirsiyeke îjdil de ne û li ser jiyana malbatên xwe û paşeroja xwe bi tirs in, ji bilî ku haya wan ji guhertinên ku li dunyayê dibin heye, û çavên wan bi miştî û bi dilxawziyeke mezin li azadî, demokresî û bilindkirina rûmeta mirova ye.

Ji bilî ku nofeke fereh ji qada birciwaziya dewlemend û xwedî sermiyanên mezin, ewa ku rûmeta xwe diparêze û derbas nava pîsîtî û gendeleya destlatê nebûye, ew jî ji tinebûna azadî û demokrasiyê nezrazî ne û ji kiryarên destlat û siyasetên wê yên tevahî ne fehesî ne, û ta radeke bilind li ser paşeroja sermiyanên xwe bi tirs in. **D.R(11)**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org